

Agahdariya Corona,

Pêwîate ku em hemî hefteyên pêş de alîkarî bikin da ku belavbûna korona vîrus kêmbikin (covid-19)

Ji bo wîlayeta Brandenburg 1, desthilata wîlayetê ev biryarên jêrîn da:

- Hemû cihên ne girîng di jiyana rojana de, dê bên girtin.
- Navendên guhdana laşî dê bêne girtin (Wek berber û salonên bedewiyê), xwaringeh û otêl divê bimînin girtî.
- Karûbarê radestkirinê û gihandina xwarinê ji bo malê ranaweste.
- Supermarkete, firotgehên xwarin û vexwarinan, û bazarên heftane dê vekirî bimînin.
- Wekî din, ev jî dê vekirî dimînin:
 - Dermanxane.
 - (DM) - Firotgehên bîhnexweş û paqijkirinê.
 - Qereqolên gazê
 - Dezgehên bankayan û peran.
 - (Post) Mail.
 - Navendên şuştin û paqijkirinê.
 - Firotgehên amûrên avahiyê.
 - Klînîk û nexweşxane.
 - Navendên tenduristiyê.
 - Navendên nûçeyan.
- Civîn divê ji du kesan zêdetir ne be. Ji bilî malbat û kesên ku di xaniyê bi hev re de dijîn.
- Pêwendiya bi mirovan re kêmbikin.
- Li cihên giştî, divê hûn dûr û dirêjîya 1.50 metre di navbera we û kesên biyanî de bidin.
- Na be zêdeyî 10 kesan di heman demê de li cihên benda (rawestgehên otobusê) bimînin.
- Çûna cihên giştî qedexe ye (wek rê, kolan, otombîlên veguhastin û parkan) ta 5 Nîsanê heta demjimêr 12 şev.
- Derketina li cihên giştî tenê ji bo armancên jêrîn destûr e:
 - Kirîn an karên din ên ji bo guhdana kesane.
 - Serdana bijîşk û dermankirinên bijîşkî.
 - Eger pêwîstiya dermanî ya lezgîn hebe serdana nexweşên psîkolog an fîzyoterapî bike.
 - Serdanên kesên pîr û nexweş ji hêla hevjin û hevkarên wan ve.
 - Kes û zarokên xwedî hewcedarî.
 - Beşdarî cenazeyan û goristanê bibin, tenê eger ji malbatê bin.
 - Tevgera sporê li derve, (Baştir e, bi tenê, yan bi kesekî tenê re, an li dora malê)
 - Hevdîtinên lezgîn bi, dadgeh an parêzeran re pêk bînin. Ev yek her weha ji bo berhevkirina peran û berdêlên pera yê ji saziyên werzîşê yê civakî jî pêk tê.

2. Çawa ez dê bi vîrûsê Korona bikevim ?

Vîrus ji kesekî bi kesekî din re derbas dibe. Ev yek pêk tê, ji bo nimûne, gava ku hûn dikuxin, diaxivin an jî gava ku kesekî bi yekî re dest digire.

3. Ez çî karim bikim ji bo xwe û kesên din biparêzim ji vîrusê Korona?

- Şîştina destan bi tevahî û birêkûpêk (tevî zarok û ciwanan).
- Pişik tenê di destmalek an mil de (her weha zarok û ciwanan).
- Destê xwe nedin rûyên xwe.
- Odeya / mala xwe bi rêkûpêk paqij bikin.
- Amûrên xwarinê bi kesên din re bi kar neyînin.
- Kêmkirina pêwendiya bi biyaniyan re, û ev vana hem li cihên giştî û hem jî ji bo cihên taybet.
- Ji bo çend hefteyên din têkiliya bi mirovan kêr bikin (destan, ramûsandin)
- Dema kirîna an li ser otombîlên veguhastinê bi dûrbûna 1,5 metre ji yê din bimînin.

4. Çawa bizanin ka virus bi we re heye?

- Eger vîrus bi we re hebe, hûn dê nîşanên wekî kuxikê, sermayê û tayê derxin.
- Ev pir dişibe grîpê. Hinek kes diyarde ne (zikê wan diçe).
- Hin nexweş bi pirsgirêkên tîrêjê an pneumonia hene.
- Eger vîrus hebe, nîşanên nexweşiyê dibe ku piştî 14 rojan nû bide xwiya kirin.

5. Eger nîşanên nexweşiyê hebin ez çî bikim?

Ji kerema xwe neçe cem bijîşk (doctor)! Bi xebatkarên civakî yê koçberiyê re biaxive, û ew ê bi ewlehiyên taybet re biaxivin.

Eger hûn bi Almanî diaxivin, ji kerema xwe telefona Doktorê malbata xwe bikin

117 (hejmara karûbarê bilez). - An jî 116 bixin.

6. Çima ez nikarim ji odeya / mala / apartmana xwe derkevim?

Eger tu nexweş an gumanbarê nexweşiyê bî, tû dê bi tenê yan di girtina tenderûstî de bî. Heya ku tû nexweşiyê bigerîne, dive hinek fermanên taybet li ser te bi cî bibin ji bo ku yê din biparêzin. Tû nikare ji (ode / mal)a xwe derkevî bêyî destûra berpirsiyaran. Û hemû pêwîstiyê te dê bi cî bibin di Odeya te de.